

KurdîLit

Tora Wêje û Weşangerîya Bi Kurdî Li Tirkîyeyê

Wêje û Weşangerîya Bi Kurdî Li Tirkîyeyê:

Nivîskar, Wergêr, Weşanxane û Kovar (Reşemî - Pûşper 2016)

Ya ku amade kir: Mukadder Ezel Yılmaz

Wergera Bo Kurdî: Kawa Nemir



Pêşek

Statûya Kurdîya ku yek ji xalên gotûbêjê yê girîng ên qonaxa demokratîkbûna Tirkîyeyê ye û sînorên qadên wê yê bikarhatinê li nava welêt wisa xuya dibe ku wê di salên bê de jî pê berdewam bibe di rojevê de bimîne. Van daxwazên ku heta îro li ser xîmê azadîya derbirranê di qada sîyasî de, mafên keltorî û mafên zimanî hatine rewakirin rola xwe ya mezin heye di geşbûna gotûbêjên li ser firehkeltorîyê û firehzimanîyê yê li Tirkîyeyê de. Nexasim daxwaza bo perwerdeya bi zimanê zikmakî, nasbûna Kurdî bi şeweyekî fermî û xebatên arasteyî belavebûna wê li qada civakî di vî warî de xwedan cîyekî girîng e. Dem û dezgehên ku tevgera sîyasî ya Kurdan li dijî mekanîzmeyên çewsanê yê sîyasî û civakî yê li ser zimên pêk anîne û rêbazên ku wê perisandine hê jî bestê tînin li daxwazên bo mafên zimanî yê komên kêmar ên curecure ên li welêt.

Dê ne şaş be ku em bibêjin pêdagirbûna di bikaranîna zimên de li dijî çewsan û berbendkirinên ku nasnav û keltora Kurdî duçarî wan dibin êdî bûye rêyeke têkoşanê. Çi qasî xebatên bo perwerdeya bi zimanê zikmakî di vî warî de roleke navendî bigêre jî, belavebûna bikarhatina zaravayên Kurmancî û Kirmanckî yê Kurdî di şaxên her wekî wêje, şano û sînemayê de jî tevî wê têkoşanê ye ku bi zimên ve tê birêvebirin. Lê dîsa jî keltor û hunera ku bi van zaravayan tê berhemhênan pirrî caran di çarçoveyê sînordar bi gotûbêjên sîyasî de têne hêlsengandin. Lêbelê, ji van gotûbêjan û bi wê de, ku keltor û hunera ku bi Kurdî tê berhemhênan li ser asta berhemhênanên keltor û hunerê yê mayîn ên li cîhanê bîhêlsengandin, deravên berhemhênanê bîhêvêkirin û xuyanîtiya wan were zêdekirin, reng e ev wekî alavên potansiyel werin hêlsengandin ku çêdibe sûd ji wan were wergirtin di rêya bîhartina pêxemên li ber zimên de.

Bi peywenda berhemhênan û belavebûnê, wêjeya ku rasterê peywendîdar e li gel statûya zimên û sînorên warên wî yê bikarhatinê, yek ji şaxên hunerê ye ku bandora gotûbêjên sîyasî li pey wan dikule. Ne bi text û bext e ku li Tirkîyeyê kar û xebatên wêje û weşangerîya bi Kurdî di 1990'î wan çaxan de, salên ku dest pê kirîye şer û têkoşana sîyasî tund bûye, zêde bûne. Berhemhênanê wêjeyê ya ku hevterîbî zor û zexta dewletê ya li ser nasnavê vejîyaye li dijî nasnava neteweyî ya ku li şûna Kurdbûnê dihate ferzêkirin bi Kurdî roleke redîyeyê li xwe digirt. Çêdibe were gotin ku di vê serdemê de gotûbêj û berhemhênanên wêjeya bi Kurdî li dora dem û dezgehên Navenda Çanda Mezopotamyayê (1991) û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê (1992) kol vedane. Pê re jî, di rojnameya Azadiya Welat de, ya ku ji sala 1994'an û pê ve dest pê kir hefteyî hate weşandin û di wê serdemê de di geşedana Kurdî de roleke xwe ya girîng hebû, berhemên hin nivîskar û helbestkaran dihatine belavkirin. Van salên ku nivîskar û weşanger ne kêmirî sîyasetmedaran tûşî zor û zextan dibûn, ev kar û xebatên wêjekarên ku ji

ber berhemên ku dinivîsîn û diweşandin dihatine girtin û ceza li wan dihatine birrîn di salên 2000'î de bi beşdarîya ekterên nû zêde bûn, nasnaveke Kurdistanî li xwe zêde kirin û berdewam bûn. Van weşanxaneyan navendên xwe bar kirin ji Stembolê birin Amedê. Di sêrî de li Amedê, li bajarên Kurdan weşanxaneyên nû hatin damezirandin. Wergerên bi Kurdî yên nimûneyên ji wêjeya cîhanê hatin çapkirin. Bi vê bizavdarbûnê re hin weşanxaneyên ku weşanê bi Tirkî dikin dest pê kirin berhemên bi Kurdî çap kirin û wergerên bi Tirkî yên hin berhemên bi Kurdî xwestin. Bi piştevanîya Enstîtuya Kurdî ya Amedê û Kurdî-Derê dest pê bû xebatên nû yên der barê ziman û wêjeyê de hatin kirin. Beşa wêjeyê ya di sala 2010'an de li jêr banê Navenda Çandê ya Cegerxwîn a Şarevanîya Peyasê ya Amedê hatî damezirandin jî tevî van dem û dezgehên bû.

Hevkat li gel van rûdawên di warê wêje û weşangerîya bi Kurdî de, di çarçoveya jimareyek çakkirinan de, ku ji alîyê hukimeta wê hingê ve pêşî di sala 2009'an de wekî Çaresazîya Kurdî hate pêşkêşkirin, di pey re jî nav î wekî pakêtên demokratîkbûnê hate hildan, destûr hate dayîn ku kanalên taybet bi ziman û zaravayên ji bilî Tirkî 24 saetan weşanê bikin. Her wisa, YÖK'ê (Desteya Perwerdeya Bala) biryar girt ku bi ziman û zaravayên cîyawaz amojgeh û navendên lêkolanê bîn damezirandin; di zankoyên dewletê de Amojgehên Zimanên Zindî hatin damezirandin û di binkeyên van amojgehên de beşên Kurdzanîyê hatin vekirin. Televizyona bi Kurdî ya bi piştevanîya dewletê ya pêşî di sala 2009'an de dest bi weşanê kir. Kurdî ji alîyê ve di nava gel de, ji alîyê din ve jî di civata rewşenbîran de kete qonaxa nasbûn û asayîbûnê. Ku xebatên wekî lêkolan, semîner û konferansan ên der barê ziman û wêjeya bi Kurdî de hatin veguhestin bo asta akademîk, vê yekê bi ser xist ku hem li Tirkîyeyê, hem jî li qada navneteweyî peywendîyeke arasteyî wêjeya bi Kurdî were mexderê. Digel vê yekê, ev xêrebûn dûr e ji wê yekê ku bikaribe wêjeya bi Kurdî û ekterên wê li Tirkîye û li qada navneteweyî bi têra xwe bike xuyanî. Ziman û wêjeya bi Kurdî, çî ji ber ku zimên hê jî statûyeke fermî bi dest ve neanîye, çî jî ji ber ku polîtîkayên keltorê yên ku curecurîtîya keltorî han didin û piştevanîyê bo wan dikin kêmtir in, hê jî yek ji warên dezavantajdar ên nexşeya keltorî ya Tirkîyeyê ye.

Armanc û Bergeha Xebatê

Çawa ku li jorê jê behs hate kirin, digel ku li Tirkîyeyê di warê weşangerîya bi Kurdî de van salên axirîyê xêrebûneke girîng hatibe zeftkirin jî, xuyanîtîya wêjeya bi Kurdî ya li Tirkîyeyê û li qada navneteweyî heta em bibêjin berteng e, ev yek hem ji bo pişka berhemhêner, hem jî ji bo ya xwîner hê jî kêşe ye. Li dû vê tesbîtê, Navenda Hunerê ya Dîyarbekirê (DSM), Weşanên Lîsê û Literature Across Frontiers (LAF) projeya malpera **KurdîLît: Tora Wêje û Weşangerîya Bi Kurdî Li Tirkîyeyê** sêwirand. Ev xebata ku armanc dike zanyarîyên heyî yên peywendîdarî ekterên wêjeya bi Kurdî ya rojaneyî ya ku ji layê mafên keltorî û azadîya derbirranê ve li yek warên cîyê metirsîyê ye bicivîne, li gel berhevkirina zanyarîyên rojaneyî û serekî yên peywendîdarî ekterên (weşanger, nivîskar, wergêr, dem û dezgehên zimên û wêjeyê) yên ku li Tirkîyeyê di warê wêje û weşangerîya bi Kurdî de bi kar û xebatan berdewam in û arşîvkirina wan di hawirê online de, her wiha armanc dike ku tevkarîyê bike li pêkanîna torekê di navbera van ekteran û ekterên wêjeyê yên Tirkîyeyî û Ewrûpayî de jî. Armanc ew e ku danasîna kogeha daneyan a bi dest xistî were kirin bo civatên ku li Tirkîyeyê û li Ewrûpayê bi wêjeya bi Kurdî eleqedar in, bizavdarîya ekteran a li hundirê Tirkîyeyê û li Ewrûpayê û bi vê

rêyê ragihana di navbera civatên wêjeyê de were geşkirin. Tê çaverêkirin ku ev ragihan rê xweş bike li ber xebatên ku bêne kirin ji bo ku berhemên bi Kurdî bo zimanên cîhanê bêne wergerandin.

Piştî Li Amedê Rojên Wêjeya Berawirdkî ya ku di sala 2013'an de ji aliyê dem û dezgehên hevpar ve hate pêkanîn, ev dem û dezgeh tê de berdewam bûn di warê Wêjeya bi Kurdî de li ser projeyên hevbeş xebitîn, KurdîLît jî wisa çêbû. Dema ku di Reşemîya 2016'an de xebatên xwendinê yên lêkolanê yên li ser rabirdû û îroya wêjeya bi Kurdî ya li Tirkîyeyê hatin kirin, xebatên bo malperê dest pê bûn. Bi hevkatî lîstên ekterên cîhana wêje û weşangerîyê hatin amadekirin. Di vê pêpelûkê de, bi beralîkirinên koordînatorê naverokê yê projeyê Lal Laleş ve , li dû çavpêketinên li gel navenda Amedê ya Komeleya Nivîskarên Kurd û şaxa wê ya Êlihê di mijara amadekirina lîstan de piştevanî hate wergirtin. Di nava meha Reşemîyê de li bajarên Amed, Stembol, Mêrdîn, Êlih û Wanê civînên danasîna projeyê û pêkanîna torê hatin birêvebirin û nivîskar, wergêr, nûnerên weşanxaneyan, edîtorên kovaran û nûnerên dem û dezgehên wêjeyê yên li van bajaran hatin vexwendin. Enstîtuya Kurdî ya Amedê ya ku ji layê nimana wêjeya bi Kurdî li ser asta damezraweyî ve cîyekî xwe yê girîng heye, Komeleya Demokrasî, Keltor û Hevkarîyê ya Kurdan (Kurdî-Der) Beşa Wêjeyê ya Akademîya Cegerxwîn jî ji wan dem û dezgehên bûn ku di vê qonaxê de li gel wan şêwr û mişêwre hatin kirin. Di henga civînan de, hizr û pêşniyarên peywendîdarî sêwiran, naverok û berdewambarîya malperê hatin gotûbêj kirin, ya ku dê bi armanca pêkanîna xuyanîtiya wêjeya bi Kurdî bihata amadekirin. Bi gurra pêşniyaran, biryar hate dayîn ku li jêr çar sernavên sereke -nivîskar, wergêr, weşanxane, kovar- cî ji zanyariyên profîlan re were terxankirin û peywendî hate çêkirin li gel devîdevî sed û pêncî kesayet û dem û dezgehên. Dawîyê, deqên ku wekî naveroka malperê hatin amadekirin bi sê zimanan di qonaxa xwendinê ya dawîn re hatin derbaskirin û di malperê de hatin weşandin. Malper di nava Pûşpera 2016'an de bi civîneke encamê ya ku ekterên wêjeyê yên li Amedê û li derdora wê tê de vexwendî bûn bo ragihaniyê hate vekirin. Tê pîlankirin ku danasîna malperê pêşî li Tirkîye û Ewrûpayê di çalakîyên wêjeyê yên curecur de were kirin.

Çarçoveya Raportê

Bi maweya projeyê, ku xebat berdewam bûn li ser malpera ku jêderana sereke ye, ji aliyekî ve jî hevterîbî hizr û pêşniyarên ku ji ekteran hatin wergirtin ev raport li qelemê hate xistin. Ev raporta ku hate amadekirin bi rêya daneyên ku hatin bidestxistin ji boçûnên ku hatin wergirtin di henga civînên torpêkanîne de, ji deqên profîlan ên ku ji aliyê ekterên wêjeyê ve hatin amadekirin, ji çavpêketinên yekeyek ên ku li gel wan hatin kirin û ji pirsnameyên ku wan bi e-posteyê bersiv dan, çêdibe ku wekî helsengandineke rewşê ya peywendîdarî wêje û weşangerîya bi Kurdî li Tirkîyeyê were xwendin. Ev xebata ku xwe dispêre nivîskar, wergêr, weşanxane û kovarên ku di vî warî de kar û xebatan dikin û ezmûnên wan ên di vî warî de, mîsyona ku kesayet û dem û dezgehên ku di warê wêje û weşangerîyê de kar û xebatan dikin dane ber xwe, kêşeyên ku di vî warî de ew duçar dibinê û pêşniyarên wan ên çareserîyê bo van, pêşbînîyên wan ên der barê dahatûya wêje û weşangerîya bi Kurdî de bi xwe ve digire.

I. Ekterên Wêjeya Bi Kurdî Li Tirkîyeyê

Warê wêjeyê her wekî bitûnekî kar û xebatên hem hunerî hem jî aborîyî cîhanek e ku gelek ekterên curecur tê de digihîjine hev. Nivîskar û wergêr, weşanxane û kovar; her çar ekterên sereke yên ku malper bi hûrgilî berê xwe dide wan, li gel wan, kar û xebatên wêjeyê yên ku li ser destê dem û dezgehên wekî Enstîtuyên Kurdî, Kurdî-Der û Navenda Çandê ya Cegerxwîn têne birêvebirin jî xwedîyên cîyekî girîng in di nava wêjeya bi Kurdî de. Her çend di bergeha vê raportê de li jêr çar sernavên malperê em ê bi hûrgilî berê xwe bidine nivîskar, wergêr, weşanxane û kovaran jî, hevterîbî zanyarîyên ku li dû çavpêketinan hatine bidestxistin dê kar û xebatên van dem û dezgehan ên di warê wêjeyê de jî bêne belavkirin.

Nivîskar û wergêrên ku li derawayaya afirînerbûn û berhemhênerbûnê ne ji ekterên sereta yên vî warî ne. Li dû zanyarîyên ku ji dem û dezgeh û nûnerên weşanxane û kovarên li jorê nav hatî hatin wergirtin, li gel 120 nivîskar û helbestkarên ku li Tirkîyeyê bi zimanê Kurdî dinivîsin û berhemên wan ên çapkirî hene peywendî hate çêkirin. Li gel hejmara nivîskar û helbestkarên ku bi awayekî bi rêk û pêk tevkarîyê li weşanên mawedar dikin ev hejmar hê zêdetir dibe, lêbelê zehmet e ku ji bo tewawîya vî warî mirov xwe bigihîne hejmareke safî. Ekterên dîtir ên girîng ên warê wêjeyê her wisa wergêr in ku berheman werdigerînin û hema bibêjin wan ji nû ve çêdikin. Beşeke ne hindik ji nivîskaran li cîhana wêjeya bi Kurdî pê re jî kar û xebata wergêranê jî bi rê ve dibin. Beşeke zore ji van ew wergêran in ku ji Kurdî bo Tirkî yan jî ji Tirkî bo Kurdî têne kirin. Ji bilî Tirkî, di sêrî de Îngilîzî, wergerin jî hene ku ji hin zimanên Ewrûpayê û ji zimanên Erebi û Farisî têne kirin. Ji bilî wêjekarên ku hem nivîskar, hem jî wergêr in, li nava wêjekarên ku bi tenê wergêrîyê dikin, hejmara yên xwedan berhemên çapkirî lap kêr e. Ku di bergeha projeyê de bes li gel nivîskarên xwedan berhemên weşandî peywendî hate çêkirin, bi armanca ku daneyek were bidestxistin ku bi kêr bê da ku potansîyela di warê wergerê de were pîvandin, wergêrên ku berhemên wan ên weşîyayî nînin, lêbelê tevkarîya wergerê dikin li weşanên wêjeyê yên mawedar jî tevî bergeha xebatê bûn. Bi rêya weşanxaneyan, kovaran, Kurdî-Derê, Enstîtuya Kurdî ya Amedê û nivîskaran, peywendî hate çêkirin li gel danzdeh wergêrên ku bi tenê kar û xebatên wergerê dikin.

Weşanxaneyan pêpelûkeke din a projeyê pêk anîn ku rola girîng digêrin di belavekirina wêjeya bi Kurdî de. Wextên ku sînorên bikarhatina Kurdî ya di qada gelemperî de jî bo maweyeke dirêj ne dîyar bûn û reftarên cezayî bi şiroveyên kêfî dihatine sepandin, weşanxane bi şêweyekî damezraweyî bûn ekterên ku dabîn kirin Kurdî di bazarê de bimîne. Ji weşanxaneyên ku tevî weşanxane û amojgehên ku ji bilî yên wêjeyê weşanên lêkolan û vekolanê çap dikin hejmara wan di ser sîyê re ye hindik jî hene ku berê hatine girtin, îro navên xwe guhertine û di weşangerîya xwe de berdewam in.

Weşanên mawedar ên ku tevkarîyê li berdewambarîya wêjeyê dikin û nemaze bo wêjekarên nifşê nû qadan vedikin navenda çarem a projeyê pêk anîn. Kovarên ku çeşnên wêjeyî û rexneyên wêjeyê belav dikin îro ji alîyê hemû pişkên civakî ve wekî dibistanên wêjeya bi Kurdî têne pejirandin. Em dikarin bibêjin her ekterekî ku di warê wêjeyê de wekî nivîskar û wergêr bi berhemhênanê berdewam e ceribandînan xwe yên pêşîn bi rêya kovaran digihîne xwîneran. Her wiha, gelek nivîskar, wergêr û lêkolîner bi maweya karên xwe peywendîya xwe

ji kovaran qut nakin û pê berdewam dibin pevgihana li gel xwîneran dikin domdar. Weşanên mawedar ên ku delîvayan bîter dikin berhemên nîfşên cîyawaz bi ser hev de bîna wisa jî dihêlin ku weşanxane û nivîskar, helbestkar, wergêr û lêkolînerên nîfşê nû nasîya xwe bidine hev. Li nik vê yekê, ev rolê digêrin ku kanalên ragihanê yên di navbera wêjekar û lêkolînerên wêjeyê yên ji parçeyên cîyawaz ên Kurdistanê de vebin. Sebaret bi vê yekê, wê ne çewt be were gotin ku kovar di navbera ekterên wêjeyê de rola torpêkanîna digêrin. Her wiha, kovargerîya ku warek e ku nisbet bi weşangerîyê berhemhênan û belavkirin hê bileztir tê de tê kirin dikare nivîsarên wêje û rexneyê jî pêşkêşî xwînerên peywendîdar li gel wêjeyê bikin. Dawîyê, kovar bi nivîsarên rexne û lêkolanê yên ku ew di warê wêjeyê de diweşînin bala xwîneran dikişînine ser berhemên wêjeyî û bi awayekî ji awayan danasîna berhem û ekteran jî li xwe digirin. Di bergeha xebatê de, di sêrî de li Amed û Stembolê, li gel bîst û du weşangeran û çardeh kovaran peywendî hate çêkirin ku li Tirkîyeyê di warê wêjeya bi Kurdî de kar û xebatan dikin.

Di civîn û çavpêketinên bi maweya projeyê de, behs ji ekterên dîtir ên li cîhana wêjeyê jî hate kirin. Di nava van de yên sereta xwîner in ku ji bo berdewambarîya berhemhênanana wêjeyî ekterên sereke ne. Girîngîya xwînerên ku eleqeyê bi wêjeya bi Kurdî dikin û vê eleqeyê di warê akademîk de bi xebatan qayîm dikin bo paşwextîya wêjeyê ji aliyê her pişkekê ve bi taybetî hate dupatkirin. Ji layê dî ve, amaje pê hate kirin ku rola belavkaran, kitêbxane û sekûyên firotana pirtûkan ên online yên ku berheman û bikirran digihînin hev û din çendî girîng e di zêdebûna xuyanîtiya wêjeyê û berdewambarkirina berhemhênanana wêjeyî de. Dawîyê, nexasim behs jê hate kirin ku di henga damezirana kovaran de komên xwendinê û sekûyên medyaya civakî çendî girîng in.

II. Mîsyon, Armanc û Kar û Xebat

Dema ku mîsyona ku civatên peywendîdarî wêjeya bi Kurdî yên li Tirkîyeyê danîye ber xwe tê hêlsengandin, divê statûya Kurdîyê û çewsan û kend û kospên ku nasnava keltorî ya Kurdî li welêt duçarî wan dibe bêne berçavkirin. Em dikarin bibêjin, ekterên ku îro li ser dika wêjeya bi Kurdî ne, cara pêşîn di salên 1980'yî û 1990'î de peywendî danîne li gel wêjeyê. Van ekteran berhemên xwe yên wêjeyî yên pêşîn di nava mercên sîyasî û civakî yên salên 1990'î de hênan. Van salên ku şerê li Kurdistanê di warên fermî û nefermî de her berdewam ji berêkê ve tundtir dibû, berhemhênanana hunerî û rewşenbîrî ya bi zimanê Kurdî yan jî pêşkêşkirina vê berhemhênanê bi xwe diqewimî ku propagandaya sîyasî bihata hesibandin û ceza li van yekan bihata birrîn. Di vê serdemê de, kar û xebatên rojnamevanîyê, kovargerîyê û wêjeyê yên bi zimanê Kurdî yên gelek kesan diqewimî ku bi bidûrxistina ji perwerdeyê û pîşe, bi girtinê, bi cezayê diravî yan jî bendîxaneyê, bi kuştina bêdarazî yan jî bi bêserûşûnkirina di destgîrkirinê de bi encam bibûya.

Di serdemeke wiha de, birrek ciwan û rewşenbîrên Kurd tevî kar û xebatên sîyasî dibûn û tê dikoşîyan li dijî neheqîyên ku rabûbûne ser zîn. Nivîskar, wergêr, weşanger û kovargerên çavpêketin li gel wan hatî kirin derbirrîn ku wan xwe li wêjeyê girtin bi vîyana ku di nava vê têkoşanê de malekê ji Kurdîyê û nasnava Kurdî re vekin. Gotin ku wan kar û xebatên wêjeyê

yên wekî bertek bo redbûna zimên û nasnavê li dijî polîtîkayên bişaftinê di nava qonaxeke "hişyarbûna neteweyî" de dest pê kirî bere bere ji dilqê mijara heyînê derxistin û bi şayîşên wêjeyî di wan de berdewam bûn. Ji alîyekî din ve, rûxana li ser zimên û keltorê ya bajarbûnîya ku di pey koça bi darê zorê re pêk hat jî ji wan sedeman e ku van ekteran xwestin ziman û keltora li ber hişyarbûnê biparêzin û geşeyê pê bixin. Bi kurtasî, nivîsîn wekî alavekê dihate dîtin ku dê rabirdûyeke hatî bincilkirin ji nû ve pê bihata dibîrxistin û nîrxên keltoreke kolektîv a ku dihate redkirin pê zindî bihatana hiştin.

Gava ku em li îro dinihêrin, dê ne şaş be em bibêjin ku ev ekter hê jî vê mîsyonê dihebînin. Hate raçavkirin ku bi salên 2000'î re hem hejmara nivîskar û wergêran, hem jî ya weşanxane û kovaran zêde bûye. Kawdanên di warê dezgehî de yên wekî damezirana Komeleya Nivîskarên Kurd û Enstîtuya Kurdî ya Amedê di sala 2004'an de bi vê zêdebûnê re hatin. Komeleya Nivîskarên Kurd dabû ber xwe ku geşeyê bi ragihana di navbera nivîskarên Kurd de bide û çawanî û çendanîya berhemên bi Kurdî zêde bike. Enstîtuya Kurdî ya Amedê jî, ku ji hêlekê ve piştevanîya helmetên peywendîdarî zimên dikir, ji hêla din ve dest pê kir xebatên lêkolan, berhevkirin û wergêranê yên bi taybetî der barê wêjeya klasîk û wêjeya gelêrî de bi rê ve birin. Di nava deh salên bihurî de pirtûkên lêkolan û berhevkirinê yên peywendîdarî wêjeya klasîk, wêjeya gelêrî, ekola Hawarê, ekola Tîrêjê, wêjeya sirgûnê ya li Ewrûpayê, wêjeya bi Kurdî ya Qafqasan û wêjeya bi Kurdî ya serdema piştî salên 1990'î yên nivîskaran hatin weşandin. Li nik van xebatên berê xwe bi hûngilî dayî keltor û zimanê Kurdî, em dikarin bibînin ku nexasim hejmara berhemên nivîskar û helbestkarên ji nifşê nû û wergerên nimûneyên ji wêjeya cîhanê ya hevçax zêde dibin. Rêzepirtûkên tematîk ên ku weşanxane arasteyî kişandina bala pişkên xwîneran ên cîyawaz amade dikin û çalakîyên ku ew li dar dixin ji bo ku xwe bigihînine xwîneran ji wan xebatan in ku arasteyî perisandina xwîneran têne lidarxistin. Her wisa, yek ji geşedanên erênî ye ku hejmara kovarên wêjeyê û rexneyê yên ku bi Kurdî têne weşandin zêde dibe. Edîtorên kovaran amajeyê pê dikin ew girîngîyê pê didin ku hem berhemhênan di warê wêjeyê de zindî bihêlin, hem jî bo xebatên akademîk ên di vî warî de warekî vekin. Kovar wekî alavên girîng têne dîtin ji bo ku nivîskar û rexnegirên ciwan xwe bidin xuyakirin û xwe biperisînin. Ev kovar nemaze nimûneyên ji wêjeya cîhanê û nivîsarên peywendîdarî teorîya wêjeyê yên ku li welatên cîyawaz hatine weşandin belav dikin û şayîşa werarkirina Kurdîyê û wêjeya bi Kurdî bi wan re heye, lewma jî îşaretê didin ku dê di vî warî de ne bi tenê kawdanên çendanî, her wisa yên çawanî jî çêbibin.

III. Kêşeyên Ku Wêjeya Bi Kurdî Bi Wan Ve Derdikeve

Weku li jorê behs jê hate kirin, dem û dezgeh û kesayetên ku li Tirkîyeyê di warê wêjeya bi Kurdî de kar û xebatan dikin di rabirdûyê de bi kêşeyên girîng ve derketin. Digel ku em dikarin bibêjin îro ro ev war bi dîmaneyî serbest hatiye hiştin û bi vê yekê re jî kar û xebat zêde bûne, gengaz e ku em nimûneyan bibînin wekî hê jî dilqê propagandaya sîyasî li weşangerî û nivîskarîyê dikin, ceza li wan tê birrîn yan jî pêşî li wan tê girtin. Guşara sîyasî û sepanandinên cezayî yên kêfî hê jî ji astengên girîng in ku nahêlin wêjeya bi Kurdî dakeve bazarê û xwe bigihîne xwînerên xwe. Bi vê yekê re, ku statûyeke fermî ya Kurdîyê hê jî tine û wekî zimanê perwerdeyê gelekî bi bertengî tê bikaranîn, ev dibe binas ku cemawera xwîner

pê de pê de kê m bibê, ku jixwe dijwar e ev xebat xwe bigihîninê, û bi tenê ji pişkeke dîyar pêk bê. Çeperên warê bikarhatina Kurdîyê di jîyana rojanî de di heman katê de hem çawanîya berhemên bi Kurdî, hem jî sînoren cemawera xwîner durist dikin. Çi qasî di jîyana rojanî de sînor teng dibin, ev rewş rasterê kar di berhemhênan û kudandina wêjeyê jî dike.

Li gel van kêşeyên peywendîdarî peywenda sîyasî û bi şêweyekî peywendîdar li gel wan, hem ji bo weşangeran, hem ji bo kovargeran, hem jî ji bo nivîskar û wergêran, pêstîrtengîyên madî jî rû didin ku bi neyînî bandorê li çawanî û berdewambarîya xebatên wan dikin. Cemawera xwînerên wêjeya bi Kurdî hindik e û standardên jîyanê yên cemawera xwîner a ku jixwe hindik e ne li ser asteke kamil e ku sektor bi xweşikî bişuxule. Her wiha, weşanxaneyên ku bi Kurdî weşanê dikin neşên sûdê werbigirin ji hin piştevanîyên ku weşangerên li Tirkîyeyê dişên werbigirin. Bo nimûne, berhemên bi Kurdî hîlnadine pirtûkxaneyan, piştevanîya darayî nadine dem û dezgehên wêjeyê, wêjeya bi Kurdî û wêjekar neşên bi têra xwe sûdmend bibin ji xebatên ku ji bo danasîna wêjeyê di qada navneteweyî de têne kirin. Wekî nimûne bo vê rewşê em dikarin TEDA'yê bînin, projeya piştevanîya bo werger û weşanê ya ku Wezaretê Rewşenbîrîyê daye destpêkirin ku piştevanî were kirin ji bo ku berhemên peywendîdarî keltor, huner û wêjeyê bi zimanên ji bilî Tirkî bêne weşandin, ev proje xeyn ji Tirkî ti zimanekî ku li Tirkîyeyê tê axiftin nagire nava xwe. Tevî vê yekê, Yekîtîya Weşangerên Tirkîyeyê xalek der barê mafê xwendin, nivîsîn û weşandina bi zimanê zikmakî de zêde kir li beyannameya encamê ya Komcivîna Weşangerîyê ya Tirkîyeyê ya 7. a ku bi hevkarîya Zankoya Bilgiyê ya Stembolê di mêjûyên 12-13'ê Gulana 2016'an de hate birêvebirin. Vê xalê amajê pê dikir ku zimanên Anatolyayê yên ji bilî Tirkî nayên naskirin, ne zimanên perwerdeyê ne û bê par têne hiştin ji piştevanîyên dewletê, lewma jî li ber berhemhênanana afirîner a bi van zimanan kelem hene. Her çend lêxebitînên bi vî cureyî hê jî sembolîk bêne xuyanê jî, xîmekî pêk tînin ji bo kar û xebatên berevanîyê yên ku di pêş de di vî warî de reng e bêne kirin.

Bi kurtasî, ji ber guşaran, berastengkirinan, peydanebûna teşwîqê, neperisana xwîneran û kêşeyên bazarkarîyê, firotana berhem û kovarên ku têne çapkirin pirrî caran nikare malîyeta xwe derxe. Ji ber vê rewşê, weşanger û kovarger nikarin telîfê bidine nivîskar û wergêran, bi neçarî hejmara nusxeyên çapê kê m dikin yan jî weşanên mawedar maweya çapê dirêj dikin. Tenavê, diqewime ku nivîskar neçar dimînin sermala berhemên xwe bi weşanxaneyê re bi hevbeşî bidin. Her wiha, ji ber ku kar û kespî madî ya wêjeyê zehf hindik e, lewma jî ekterên ku di vî warî de kar û xebatan dikin bi neçarî karine din dikin da ku debara xwe bikin û ev rewş bi neyînî kar di çawanîya berhemên wêjeyî yên hênayî dike.

Arîşeyeke dîtir a rasterê peywendîdarî arîşeya madî jî ew e ku nivîskar û wergêr, berîya ku berhemên wan bînin weşandin, nikarin piştevanîya edîtorîyê her carê bi têra xwe werbigirin. Çi di warê weşangerîyê de, çi jî di yê kovargerîyê de, kar û xebatên wekî edîtorî, werger, belavkirin û peywendîyên gelemperî bi pirranî bi xwebexşî têne kirin, ev yek berdewambarîya weşanxane û kovaran dike cîyê metirsîyê û rê nade ku di van waran de profesyonelên wêjeyê bêne gihandin. Weku li jorê jî behs jê hatî kirin, yek ji sedemên kêmbûna xizmeta edîtorî û wergêrîyê ya hêja jî ew e wêjekarên ku dixwazin di vî warî de bixebitin nikarin dahata têr bi dest bixin. Ji vê hindê, edîtor bi pirranî, mîna ku di orta du kevîran de bimînin, di navbera kar û xebatên nivîskarî û wergêrîyê de dimînin ku bi hevkatî bi rê ve dibin.

Serêşîyên ku li gel belavkaran diqewimin kêşeyeke dîtir e ku nahêle wêje xwe bigihîne xwînerên xwe. Ji pirrî weşanxane û kovaran nayê ku tibabên belavkarên mezin xwestî bidin, ji layekî din ve jî qîma xwe naynin bi xizmeta ku belavkarên biçûk didin. Weşanxane û kovarger jî hene ku belavkirinê bi tenê bi derfetên xwe ve dikin. Her wisa, hizir ew e ku xebatên peywendîyên gelemperî kêm in û zemîn nîne ku danasîna kartêker were kirin ji bo ku xwe bigihînine xwîneran. Boçûn ew e ku înternet û sekûyên medyaya civakî ji bo pevgihana li gel xwîneran li ser asteke têrtijî nayêne bikaranîn.

Xaleke dawî jî ew e ku xuyanîtiya berhemên wêjeyê nikare derkeve derveyê bajarên ku xwînerên Kurdîyê lê pirr in û tew derveyê bajarên ku berhem lê têne çapkirin. Yek ji ber bendên li ber zêdebûna xuyanîtiya wêjeya bi Kurdî li Tirkîyeyê û li qada navneteweyî ew e ku berhemên bi Kurdî bo zimanên cîhanê û berhemên li cîhanê jî bo Kurdî bi rêjeyeke gelekî kêm têne wergerandin. Nexasim ji hindikbûna wergêrên tevî tora navneteweyî bûyî di warê wergerê de tê qalkirin û tê gotin ku ev rewş ji bo nivîskar û weşanxaneyan jî her bi wî meqamî ye. Her wiha, weku li jorê jî behs jê hatî kirin, kar û xebatên ekterên wêjeya bi Kurdî û xuyanîtiya van xwedan seyrekê ye ku rasterê peywendîdarî rewşa şer a li herêma ye. Rewşa şer pêxemê li berhemhênan û kudandina wêjeyê dixê ku hem kar û xebateke hunerî, hem jî aborîyî ye. Weşanxane dibêjin ku bar û doxa şer a ji havîna 2015'an û vir ve ye berdewam e li Ameda ku ji navendên girîng ên weşangerî û wêjeyê ye rêjeya firotana pirtûkan kêm kirîye û wisa lê anîye ku kar û xebatên weşangerîyê êdî rawestin. Ji layekî din ve, em dikarin bibêjin, çalakîyên ku dibûne delîve bo hevdiîtina wêjekaran, kovaran û xwînerên wan di vê qonaxê de rawestîyane.

IV. Peywendîyên Di Navbera Ekteran De

Cîhana wêjeyê warek e ku tê de tora peywendîyan a ekteran di navbera yek û din de honayî lap aloz e. Ekterên wêjeya bi Kurdî yê tûşî kêşe û astengên bi vî rengî bûyî pê re jî qal jî dikin wekî peywendîyên wan ên li gel hev û din bi xweşîkî çênabin. Ekterên ku beşdarî hemû warên xebatê dibin dupat dikin ku di navbera wan bi xwe de ragihan kêma e û ev yek çawanîya berhemhênanê kêma dike. Kêmbûna peywendîya nivîskaran li gel hev û din dike ku wêjekarên berhemafirîner dêrî li xwe badin. Ji bo wergêran jî heman rewş e. Ji hêla din ve, di peywendîyên di navbera warên xebatê yê cîyawaz de jî tengasîyên curecur diqewimin. Nexasim behs jê tê kirin ku di peywendîyên weşanxaneyan ên li gel nivîskar û wergêran de pirr û gelek kil û kêmasî hene. Weku li jorê hatî derpêşkirin, kêşeyên madî yê li ser serê weşanxaneyan rê li ber digirin ku peywendîyeke yekgirtî ji layê aborîyî û pênasî kar ve durist bibe di navbera wan û nivîskar û wergêran de. Her wiha, hin nivîskar didine xuyakirin ku ew nikarin weşanxaneyan peyda bikin ku vekolanên wan ên curecur ên xwe spartî xebata arşîvê biweşînin û weşanxane kêmbûna kar û kespî aborîyî ya xebatên bi vî cureyî wekî sedema neweşandinê nîşan didin. Ku nivîskar û wergêr di vê mijarê de rexneyê li weşanxaneyan digirin, weşanxane dupat dikin, wexta ku ew bikaribin bi şêweyekî aborîyî xwe fînanse bikin, ew dikarin bi kar û xebatên xwe yê di warê wêjeya bi Kurdî de berdewam bibin. Weşanger dîyar dikin ku pêwîst e dezavantajên li jorê hatî rêzkirin ên çapkirina berhemên bi Kurdî li ber çav bêne girtin û pêwîst e ku hêlsengandinên der barê polîtîkaya weşanê ya wan hebandî de

bi vê yekê ve were kirin. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin ku bi kovaran re bi dîmaneyî potansiyel heye ku peywendîyeke encambexştir çêkin li gel ekterên cîyawaz.

V. Pêşniyarên Bo Çareserîyê û Delîve

Ji bo hemû ekterên li cîhana wêjeya bi Kurdî wisa xuya dike ku dê pirranîya kêşeyan çareser bibin heke Kurdî bibe zimanê perwerdeyê û bi awayekî civakî were belavekirin. Di lîsta pêşdestîyan de di rêza yekem de ye ku Kurdî di warê civakî û siyasî de di rojevê de were hiştin û rûmeta wê lê were vegerandin. Amaje pê tê kirin ku wê perwerdeya bi Kurdî di nava maweya kurt û dirêj de bibe çareserî bo kêşeya çawanî û çendanîyê ya li ser serê wêjeya bi Kurdî. Sebaret bi vê yekê dê hem curecureyîya xwîneran fireh bibe, hem jî dê pêkan bibe ku wêje bikeve malan. Hemû ekter hevber in ku perwerdeya bi zimanê zikmakî merc e ji bo ku wêje bikaribe bê berbend pêşî xwe bigihîne Kurdan.

Piştî ku kêşeya pevgihana li gel xwînerên Kurd were bihartin, wekî armanceke girîng xuya dibe ku wekî pêpelûka duyem berhemhênerên wêjeya bi Kurdî û berhemên wan li Tirkîyeyê û li cîhanê bîn xuyanîkirin û nasandin. Ev ji vî layî ve girîng e ku wêjeya bi Kurdî hem tev bi wêjeya cîhanê re were hêlengandin û bikaribe afirînerên xwe xwedî bike, hem jî wekî kar û xebateke aborîyî bikaribe weşangeran têr bike. Nivîskar û wergêr dîyar dikin ku di vê mijarê de rolên girîng bi para weşanxaneyan û dem û dezgehên wêjeyê dikevin. Amaje pê tê kirin ku pêwîst e pêşî ekterên vê wêjeyê bi rêya proje û çalakîyên curecur biçine civatên wêjeyên din ên li cîhanê û bîn nasandin ji bo ku berhemên bi Kurdî bo zimanên cîhanê bîn wergerandin. Tê behskirin ku pêwîst e bi rêya konferansan, dîdarîyên nivîskaran, fûaran û xebatên akademîk deravên torduristkirinê û ragihanê bîn vekirin û xebat bîn kirin ji bo ku wêjeya bi Kurdî bikeve bazarê û di rojevê de were hiştin. Wisa jî, tê pêşniyarkirin ku dest pê bibe modelên ragihanê yên alternatîv ên wekî sekûyên online û ragihana medyaya civakî bo vê yekê bîn bikaranîn.

Fakereke girîng a dîtir a ku rê nade wêje û xwîner xwe bigihînine hev ew e ku li hin parêzgeh û şaroçkeyên li Tirkîyeyê yên ku nifûsa Kurdan li wan pirranî ye kitêbxane nînin. Ji ber vê hindê, amaje pê tê kirin ku pêwîst e organîzasyonên wekî mîhrîcanên pirtûkan, fûaran, rojên îmzeyê, ahengên helbestxwendinê û xwendina nivîskaran bo van parêzgeh û şaroçkeyan bîn veguhestin û weşanxane û rêveberîyên xwecîyî hevkarîya xwe geş bikin ji bo ku bikaribin xwe bigihînine xwîneran. Ji bilî vê, di nava pêşniyaran de ev jî hene ku cîhana wêjeyê dikare bi sazîyên civaka medenî re proje û çalakîyên hevbeş li dar bixe, di mijara perisandina belavkirinê û xwîneran de dikare şîrkatiyan jî damezirîne da ku xuyanîtiya wêjeyê were zêdekirin û ew bikaribe xwe bigihîne xwîneran.

Kêmbûna ragihana di navbera berhemhênerên wêjeya Kurdî bi xwe de û girîngîya birêkxistinbûnê ji aliyê hemû layenan ve tê derbirîn. Tê daxwazkirin ku weşanger û kovarger li hev rûnên, sekûyan pêk bînin ku bikaribin ezmûnan parî hev bikin û ev bi civînan birêkûpêk bîn çalakkirin. Boçûna hevbeş ew e ku, li gel sazîyên wekî Enstîtuyên Kurdî, Kurdî-Der, Navenda Çandê ya Cegerxwîn, Enstîtuya Lêkolanên Sîyasî û Civakî ya Dîyarbekirê (DÎSA) yên ku di warên peywendîdarî wêjeyê û zimên de dixebitin û lêkolanên akademîk bi rê ve dibin,

heke amojgeh û akademîyên ku berê xwe bi hûrgilî bidine hin serdemên wêjeya bi Kurdî, dem û dezgehên wê yên dîrokî yan jî nivîskarên wê yên girîng, ev ê hem wêjekaran, hem jî xwîneran xurt bike. Amaje pê tê kirin ku teşebusa Yekîtiya Weşangerên Kurd jî, ya ku weşangeran li hev rûniştin û damezirandin hem bi armanca ku kêşeyên hevbeş bîn gotûbêjkirin, hem jî çareserî bîn peyda kirin, pêwîst e ku bi heman awayî were bipêşxistin.

Tê hizirkirin ku danûstandina ekterên wêjeya bi Kurdî ya li gel civatên wêjeyê yên li Tirkîye û cîhanê jî lawaz e û seqaya şer vê kêşeyê kûrtir dike. Tê bawerkirin ku eger hat û ev hate bihartin, tevî çalakîyên curecureyên ku bikaribin layenan bînin cem hev, bi rêya wergerandina berheman çêdibe ku danûstandin were xurtkirin. Bi boçûna ku dê kar û xebatên wergerê roleke girîng bigêrin di bipêşketina wêjeya bi Kurdî û girtina cîyê xwe li ser dika wêjeya cîhanê de, di nava pêşniyarên hatî de ew jî hebû ku komeleyeke wergerê were damezirandin û bo wergêran ferheng û rêberên rastnivîsê bîn amadekirin. Tê mulehezakirin ku pêdivî pê heye di warê wergerê de geşe bi zerengîyê bê xistin, ne bes e ku kesên bi wergêranê rabûyî bi zimên bizanibin, divê ew pûteyê bi parastina bastûra zimanan bidin û heta ku rê hebe, xwe vedin ji wergêrana ji zimanê duyem û pê berdewam bibin di vî warî de bi şeweyekî bi pîr û pergala bixebitin. Wekî din, tê diyarkirin ku îro ekterên wêjeya bi Kurdî yên li Tirkîyeyê xwendinên xwe yên li ser wêjeya cîhanê û teorîya wêjeyê bi pirranî di rêya Tirkî re dikin û ev yek kêşeyek e. Boçûn tê beyankirin wekî berhemên ku ji zimanê xwe yê resen bibine malê Kurdî dê bibin gaweke girîng ji bo kawdana wêjeya bi Kurdî û rexneya wêjeyê.

Fûara Pirtûkan a Amedê, ku Şarevanîya Parêzgeha Amedê piştevanîya wê dike û îsal ya duyem hat lidarxistin, xuyanîtiya wêjeya bi Kurdî zêde dike û dibe delîve bo dîdarîyên encambexş, ji vî layî ve roleke girîng digêre ji bo îro û dahatûya wêjeya bi Kurdî. Gava ku daxwaz tê derbirrîn ku çalakîyên bi vî cureyî û piştevanîyên rêveberîyên xwecîyî yên arasteyî wêjeyê bîn zêdekirin, pirrî caran ev fûar wekî nimûne tê nîşandayîn. Daxwaz tê kirin ku rêkxirawên mîna PEN'a Navneteweyî û PEN'a Kurd lê bixebitin ku xuyanîtiya navneteweyî ya wêjeya bi Kurdî û bazara berhemên wêjeya bi Kurdî ya li cîhanê zêde bikin. Hemû ekter hevbîr in li ser wê yekê wekî peywendîyên ku di qada navneteweyî de bîn çêkirin divê li ser bingeha kesan nemînin û bîn veguhestin bo warê sazîyî.

Di henga civîn û çavpêketinan de, yên ku bi maweya Reşemî-Pûşpera 2016'an a pêkhatina vê xebatê hatin lidarxistin, lêkdanên ku behs ji wan hatibû kirin bandora xwe li ser cîhana wêjeyê hê jî nîşan didan. Em dikarin bibêjin ku ev rewş dibe sedema reşbînîyeke giştî li ser berhembênerên wêjeyê. Digel vê yekê, hemû ekter li ser wê yekê li hev dikin ku girîngtirîn delîveya li ber Wêjeya bi Kurdî ew e ku ev war beyar e. Nivîskar û helbestkar amajeyê pê dikin ku hê gelek çîrok hene ku bîn nivîsîn, wergêr amajeyê pê dikin ku hê gelek berhem hene ku ji Kurdî bo cîhanê û ji cîhanê bo Kurdî bibin mal, weşanxane amajeyê pê dikin ku hê gelek behre hene û kovar amajeyê pê dikin ku hê gelek dosye hene ku bêne amadekirin.

VI. Pêşbînîyên Bo Dahatûyê

Bi raya ekterên wêjeya bi Kurdî, berawirdî deh salên bihurî, dera ku îro ew hatinê erênî ye. Digel vê yekê, gava ku em ji îro de ber bi dahatûyê ve binihêrin, pêkan e ku em behsa du

pêşbînîyên cîyawaz î zal bikin. A pêşî, ji ber hejmara nivîskar, helbestkar û weşanxaneyan a ku li ser dika wêjeya bi Kurdî zêde dibe, ew pêşbînî ye ku di vî warî de ew ê ber bi dereke baştir ve biçin. Ekterên ku ji vî layî ve dinihêrin hizir dikin ku ji nava nifşê nû de qelemên xurt hulustîyane û ev qelem dikarin peywendîyan li gel cîhanê çêkin û wêjeyê bi pêş ve biherin. Wekî din jî, ew derdibirrin ku danûstandina li gel parçeyên din ên Kurdistanê ya di rêya wêjeyê re zêde dibe jî rûdaweke hêvîbexş e di vî warî de.

Pê re jî tê hizirkirin ku rûdawên erênî yê li parçeyên din ên Kurdistanê eleqeya arasteyî berhemhênana keltor û hunerê ya li hemû parçeyan zêde dikin. Di pey Şoreşa Rojava re, li dû zêdebûna agahdarbûna der barê Kurdan de li qada navneteweyî, dest pê bûye hindêk nivîskarên Tirk ên ji Tirkîyeyê jî daxwazê dikin ku pirtûkên wan bo Kurdî bêne wergerandin. Bi raya berhemhênerên wêjeyê yê ku bi geşbînî berê xwe didine dahatûyê, têkoşana sîyasî bi awayekî erênî kar di nasîna wêjeyê dike.

Pêşbînîya duyem jî, ji ber ku cemawera xwîner kêr dibe û ekterên wêjeyê derî li xwe badayî kar û xebatên xwe didomînin, ew e ku dê wêjeya Kurdî hişk bibe. Pîrr û gelek kesên di warê wêjeyê de, çî qasî jî ev serdemek be ku televîzyonên bi Kurdî, kanalên radyoyê û weşan zêde bûne, amajeyê pê dikin ku rêjeya bikarhatina Kurdîyê nemaze li bajaran her kêr dibe û derpêş dikin ku nifşê nû ji Kurdî bi dûr dikeve. Tê derpêşkirin, heke Kurdî bikeve dibistanan û cîlên nû bi wêjeya bi Kurdî mezin bibin, encax wê hingê çêdibe ev gef bê bihartin, yan na, stêrka dahatûya wêjeyê geş nayê xuyanê.

Encam

Ev raporta hewsengandinê hate amadekirin li dû çavdêriyên li qadê yê projeya malpera KurdîLit'ê yê ku di navbera mehên Reşemî û Pûşperê yê 2016'an de hatin birêvebirin û dîdarîyên ku bi maweya projeyê li gel nivîskar, wergêr, weşanxaneyan û nûnerên kovaran hatin kirin. Di van dîdarîyan de, me hewil da ku em pêşî hîn bibin bê ka yê/a dîdar der barê warê xwe yê xebatê û kar û xebatên xwe yê li vî warî de rewşê çawa heldisengîne, kêşeyan çawa analîz dike û pêşniyarên wî/ê yê bo çareserkirina van kêşeyan çî ne. Di gava duyem de jî, gotûbêj hatin birêvebirin li ser peywendîyên van dîdaran ên li gel ekterên ku di warên dîtir de kar û xebatan dikin û dahatûya wêjeya bi Kurdî ya li Tirkîyeyê û li cîhanê. Ev ezmûnên ku hatin veguhestin tevî wan çavdêriyan bûn ku di xebatên bi maweya projeyê kirî de peyda bûbûn. Bi kurtasî, ev raport çêdibe wekî hewsengandineke rewşê ya rojaneyî were xwendin ku ezmûnên ekterên ku li Tirkîyeyê di warê wêjeya bi Kurdî de kar û xebatan dikin tê de tene derbirrîn.

Hemû layenên dîdar li ser wê yekê li hev dikin ku Kurdî di perwerdeyê de nayê bikaranîn, ev yek li Tirkîyeyê li ber berhemhênan û kudandina wêjeya bi Kurdî mezintirîn asteng e û cîyê Kurdîyê yê di jîyana civakî de ji berêkê ve tengtir dibe. Ev rewş hê xerabtir lê tîne, ji ber ku dem û dezgehên dewletê polîtîkayên keltor û hunerê naperisînin ku curecureyîya keltorî han bidin û piştevanîyê lê bikin. Amaje bi wan kêşeyan jî tê kirin ku yekser yan jî ne yekser peywendîdarî vê rewşê ne, ji dînamîkên navxwe yê wêjeyê û weşangerîyê bi xwe dizên. Bo nimûne, berhemhênana wêjeyî nikare xwe bi têra xwe bigihîne xwîneran, mercên birêkûpêk

ji bo berhemhênana wêje û wergera astbilind pêk nayên, peywendîya bigelemşe ya di navbera nivîskar û wergêran û weşangeran de û kêmbûna xuyanîtîya berhemhênana wêjeyî di qada navneteweyî de; ev hemû ji kêşeyan e ku hatin pênasekirin. Digel ku hin kesayet hene ku bi raya wan ev yek hemû dê bikin ku wêjeya bi Kurdî dê dêrî li xwe bade û hişk bibe, hin jî hene ku bi raya wan bi damezirana dem û dezgeh û înisîyatîvên curecur ên ku piştevanîyê li berhemhênana wêjeyî û weşangerîyê dikin û xurtkirina yên heyî, wêjeya bi Kurdî dê di pêş de bikaribe nav û dengê xwe bêtir belav bike.

Projeya malpera KurdîLit'ê hate sêwirandin ku wekî gaveke pêşîn ji xwe re bike armanc, rê xweş bike li ber xebatên arasteyî zêdekirina xuyanîtî û nasbûna wêjeya bi Kurdî hem li Tirkîyeyê, hem jî li cîhanê. Ev raport jî hate amadekirin bi hêvîya ku bikaribe şert û mercên berê û îro yên Wêjeya bi Kurdî ya li Tirkîyeyê û kêşeyên ku ew bi wan ve derdikeve pêşkêşî kesên peywendîdarî wêjeyê yên havî bo vî warî bike. Çawa ku di hewsengandina giştî de tê dîtin, li Tirkîyeyê Wêjeya bi Kurdî maye tenê li gel birrek kêşeyên ku hem ji pergalê dizên, hem jî ji şuxulîna navxwe ya sektorê. Dîyar e di vî warî de pêdivî pê heye ku lêkolanên hê bergehfirehtir û projeyên paşwextîyê bên kirin. Ji bo dahatûya Wêjeya bi Kurdî girîng xuya dike ku nexasim kargehên wergerê, komxebatên weşangerîyê, çalakîyên her wekî dîdarî û serdanên xebatê bên kirin da ku li ser kar û xebatên ku bi zimanên bêdewlet ên din têne kirin zanyarî û ezmûn bên veguhestin. Wisa xuya dibe ku bi vî yekê re xebatên ku xuyanîtî û bazara berhemhênana wêjeyî û berhemhênerên wêjeyê li Tirkîyeyê û li cîhanê zêde bikin jî dikarin beşek ji kêşeyên îro yên Wêjeya bi Kurdî çareser bikin.

Jêderkên ku di vî warî de rêxweşker in:

Înatçı Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat (Bihareke Serhişk: Kurdî û Wêjeya Bi Kurdî), Vecdi Erbay (brhv.), Weşanên Ayrıntı, Stembol, 2012

Kürt Aydınlanması (Ronîbûna Kurdan), Celîl, Celîlê, Weşanên Avesta, Stembol, 2013

Antolojiya Edebiyata Kurdî, Mehmed Uzun, Weşanên İthaki, Stembol, 2015

Kürt Romanı Okuma Kılavuzu (Rêbera Xwendinê ya Romana Kurdî), Özlem Galip û Abidin Parıltı, Weşanên Sel, Stembol, 2010

Türkiye'de ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü ve Bugünü (Duh û Îroya Weşangerîya Bi Kurdî Li Tirkîye û Sûrîyê), M. Malmîsanij, Weşanxaneya Vate, Stembol, 2

Ev xebat hatîye amadekirin di bergehê projeya malpera KurdîLit'ê de, ya ku Navenda Hunerê ya Dîyarbekirê bi hevbeşîya li gel Weşanên Lîsê û Literature Across Frontiersê (LAF), bi piştevanîya Bernameya YE'yê ya Hizra Medenî û Sekûya Wêjeyê ya Literary Europe Liveê bi rê ve dibe.

Ev xebat di bergehê Piştevanîya Bo Çalakgeran a Bernameya YE'yê ya Hizra Medenî de bi piştevanîya Yekîtiya Ewrûpayê hatîye amadekirin.

Ev xebat di bergehê Sekûya Wêjeyê ya Literary Europe Liveê (Creative Europe) de bi piştevanîya Yekîtiya Ewrûpayê hatîye amadekirin. Berpirsariya ji naveroka vê xebatê bi tewawî aydî nivîskaran e û bîr û baweriyên YE'yê vebeyan nake.